
# GOLIK

Tirmeh
Tebax
2016
Hejmar 16


Golikê ber dilan natirse ji gayê malan!
Kovara Qerfî Ya Bi Kurdî




www.arsivakurdi.org

Golik XANE









Qaşo totem girtiye, lê nani hêre. Dê paşê jî yek û yek ji min bipirse: "tren çawa bû, ajovanê wê jin bû an mêr bû û her wekî...
Bihar hatiye, pelên daran vebûne. Golikén azad li ser hêşinahiyê lotikan tavêjin
Çi ferq dike!
Tu vona bi çavên serê xwe dibînî an di hişê xwe de çêdikî?
Raman - Hemed



XEWA ŞÊRÎN
xirrrrR xirrrrR


Esas kararı açıklıyorum:
Babanın hapishaneye gönderilmesine...
Annenin yoksulluk içinde debelenmesine...
Çocukların terki-diyar edilerek, serserilik ve dilencilikle yüzyüze bırakılmasına
Aile birliğinin dağıtılmasına
OY BİRLİĞİYLE karar verilmiştir.
Hemed 2016


Tu nikari min têk bibî ZINDAN
Hemed


GOLİK Kiye?
–Yekî enibes û bijangtîre.
–Ji du mehan carê xuya dibe
–Xwediyên wî di dawa Kurditiyê de girtî ne
–Bi girtiyên zindanan re hevaltiyê dike. Di ranzaya wan de vedizele, bi wan re radibe rûdine.
–Hepsî zikê wî bi îaseya (xwarina) xwe ve têr dikin. Loma wisa bi zexm û xeşîm xuya ye.
–Stuyê xwe nade ber nîrê kesî.


Goşîst PÎŞO
O. Raman.
DIBÊJIN, EWÊ XWENDIN, NIVÎSANDIN Û DÎPLOMASÎ ME JI BIN ZILMA KÛÇIKAN XELAS BIKE. VIR E! DE BILA ÊDÎ BEN EW KÛÇIKÊN FAŞÎST Û MÊTÎNGER. EW HÊJ LI RASTÎ GINKRESAN NEHATINE!
LAW DE ME JÎ DI DÎROKÊ DE ÇI ÊŞ KIŞANDIYE JI DESTÊN VAN KÛÇIKÊN FAŞÎSTAN. BÊ SIYASET Û DÎPLOMASÎ ŞER BI SERNAKEVE
AMÎRÊ MIN TU BIHÊLE EZ WÎ GEZ BIKIM. EV PISÎKÊN ANARŞÎST TENÊ JI ÎŞKENCÊ FÊM DIKIN!
NA NA! EWÊ BIPEYIVE. DE BÊJE OXLIM, KA SEROKÇETEYÊ WE KÎ YE?
BESE ÊDÎ JI ZILMA KÛÇIKÊN FAŞÎST! ME GOT AŞÎTÎ LÊ EW JÊ FÊM NAKIN. HER ROJ LI ME DIDIN, ME DIKUJIN. ÊDÎ EMÊ NEHÊLIN EW TÊKEVIN TAXÊN ME!
BIŞEREF EWÊ ŞER DESTPÊ BIKE?
BELEDIYA AMEDÊ
CEHENEM TOPÎ TÊ OXLIM! EZÊ TIRA DI QÛNA WE DE BIKIM FIS!
Biji Sores! Bimre reformizim P. Anarşist
Ez jî te hezdikim Mina kuçiken Zine. Memo!
DE WERE OXLIM WERE! DARÊ CENETÊ JÎ DI DESTÊ MIN DE YE!
ÇIRAX LAZIME Tel. 0595 999 12 122
WE ŞERÎ RAKIRÎYE HA! A JI TE RE AZADÎ! A JI TE RE ANARŞÎT, CUDAXWAZÊ PÎS
ZÛ BI DÛ YÊN DI JÎ BIKEVIN! BILA JI DESTÊN ME NEREVIN!
AX! OY! DAYÊ! MIN DI DÊ Û JINÊN WE DE NÎ... TEK TEK WERIN OXLIM! BIMRE FAŞÎZIM. BIJÎ AZADÎ
DE LEZ BIKE SORO! BIŞEREF TU YÊ BÊ GIRTIN HA!
OXLIM LI BENDA MIN BISEKININ. WELEH EZ BÊM GIRTIN EZÊ NAVÊ WE GIŞAN BIDIM WAN. AY YADÊ! EZ WESTIYAM.
Ê ŞÎŞKO TU JÎ HINDIK BIXWE OXLIM.
HÎÇQ HÎÇQ! ANARŞÎK BI VÎ MILÎ DE REVÎYAN ABÊ!
Bijî AMED SPOR!
Ê çopê bavêje vira ew ker kurê kera ye çopçiyê taxê!
BELEDIYA AMEDÊ
LEZ BIKIN


Min tekerlek îcad kir!
Ev destarê me ye xurifiyo!
O. Raman-Hemed


Burhaniye T Tipi Cezaevi Balıkesir



# PONIJÎN


Hemed GERGERÎ














# PERVASIZ
SEÇKİN

seckin.golik@gmail.com




















# ROJÊN TENG

Beritan Can













# JUJI


## HAYDAR BAYAR


















# Kevkanî

**Ûsıv Amed**

Burhaniye T Tipi Hapishanesi












Yakında Benim olacaksın Bebeğim
Baas git laaann
Bu gece kalbim Sana emanet lala lay ley





F TİPİ CEZAEVİ
ÇOK EVE TIKANMIŞINIZ TRAVMA YAŞIYONUZ ŞUAN BENCE İNTİHAR EDİN
PROF DR HOŞT




F TİPİ CEZAEVİ
AĞIR BİR DEPRESYON BENCE İNTİHAR EDİN
PROF DR HOŞT





Xwedê kesî birçî nehêle înşella. Te nimêja xwe kir heciyo??
Erê erê min kir. Min Qurana pîroz jî xwend.

facebooktan beğeniyle beni takip eden o yırtıcı erkek sensin demkki kaçır beni
hastamısın lan sen
AYŞE DİREN




ev xeletiye ev guneye.min tıştek nekiriyee min berdéééń ...
ma mislımani listoka weye. ka were ar çı xweşe

ırkçılık
lé lé em birayé hevinnn
çavbelloq poz poznıkıl
tu jı me nine heqé te mîrine





ŞÖYLE DARBE YAPIYORMUŞ GİBİ GEL BAKİM
MURAT İPEK


# Timtêl


## Ahmet Bilge


*Elbistan E Tipi Hapishanesi*
*K.MARAŞ*




























Me çi gotibû? Em li vir siyaset, mîzah (mîz ah) û henekan dixin beroşê, nîv saetî dikelînin û Quzilqurt çê dibe. Quzilqurta me Emrîkî ye, lema The pê ve ye. The Quzilqurt..Lê Barzanîperest sax bin. Em dikin û nakin em bi qasî wan bi ser nakevin..


Ji cem Erdogan vedigerin, derdikevin hemberî medyayê û diqîrin, "Hooo çawa Salih Mislim diçe Tirkiyê? Ew neyarên me ne.." Ê hey kurê bavê min, keça bavê min, dema ku Barzanî destê Erdogan dihejand te digot "Aha ala Kurdistanê li cem ya Tirkiyê ye, ev pîroz e." Ma tu qet nefikirî bê ka çi dipeyivîn piştî kamerayan? Dema ku Barzanî digot "Tirkiye dostê me ye" lê ji bo PKK'ê digot "Bila dev ji tevgerên terorist berde" rûyê te qet neêşiya? Ma kingê parastina Kurdistanê bûye terorîzm hey gunikreşno?

Dibêjin yekîtî, li Rojava bi alîkariya Tirkan li dijî YPG'ê artêş çê dikin û ligel çeteyan li hember Kurdan şer dikin. Bawer im yekîtî û kerîtiyê ji hev nas nakin.




NIVÎSKARÊN KU PIRTÛKÊN WAN KES NAXWÎNE JI BO KU BÊN NASÎN XWE BI DORA Q*NA BARZANÎ DIXIN.

Lê hûn jî mafdar in birakên min. Tenê hûn Kurd in, em kurê kerê ne. Bila TSK li hember serxwebûna herêma Başûr bide û dewsa vê hûn ji bo dilê Tirkan rabin li hember birayên xwe çek bikişînin karekî pîroz e. -di zivistanê de bi wê pîroziyê de bimîzim ta ku kêlesî jê diçe.- Heheyt! Wek Ferhad Merdê gotiye, "Heft welat bi destê we ava bibin ez




"KURD JI SIMBÊL Û MEMIKAN PIR HEZ DIKIN"
Profegû: Cirnexweş GOLIKOV

ê jê dûr bikevim." Temam, me Quzilqurtê fam kir. Nava dilê mirov jê li hev dike û mirov vedireşe. Lê Qureder çi ye? Ew jî destbirakê Quzilqurtê ye. Hûn dizanin, Golik li girtîgehê ji dayik bû lê niha "azad" e. Lewma jî hin kes dixwazin hevsar têxin serê Golikê. Zor e heyran! Golik ne bi ka û ceh xwedî dibe! Bi pirtûkan, bi keda azadîxwazan mezin dibe, nayê dest, kes nikare bike malê bavê xwe. Eger zor bidinê dê zîtikan daweşîna binê çena "xwediyên xwe" jî û ji wan re jî bêje "Qureder". Rewşenbîr û siyasetmedarên me pir ji azadiyê hez dikin. Dikarin ji bo azadiya entelekî qeşmer şer bikin lê naxwazin em azad bin. Li hember stranên bi çiçik û memik xwe dihejînin lê dema ku di Golikê de dibînin dîn dibin. Komkujiya li hember Charlie Hebdo şermezar dikin lê dixwazin dest û piyên me girêdin. Doxîna xwe vekirine û li ber qûna Golikê rep kirine! Lê bila ev gotina min di guhê we de be, 'heta Golik bi we de rêx nede qûna xwe nade alî.'Qureder jî temam e. Ev car jî dora Keratiyê ye. Qureder û Quzilqurt mêr in. Lê Keratî jin e. Qureder derdikeve derve, jinan paçî dike memikên wan gez dike. Lê dema ku Keratî li bêhemdî li mêrekî dinêre Qureder serê wê diwerimîne. Qureder pir ker e. Nebin wek Qureder. Quzilqurt bi şev diçe nav malan, digere. Nizane hêkekê jî bişkêne. Lê dema ku tê malê xwarin ne amade be devê Keratî dişkêne. Quzilqurt ne mirov e, hûn pê de birîn. Çi gotiye seydayê pîroz doçen doxtor profesor mamoste Gernas Nenas?: "Kurdino bibin yek! Eger hûn nebin yek, bikutim we yek bi yek."



LI ROJAVAYÊ KURDISTANÊ HÊZÊN GIRÊDAYÎ ENEKS'Ê KU BI NÊZÎKAYA BARZANÎ TÊN NASÎN YEKÎNEYEK KU DÊ LI HEMBER YPG'Ê ŞER BIKE XWE BI ÇEK KIRINE.

# BOZO









## XEWN

Wê rojê min Feqîyê Teyran di xewna xwe de dît. Îcar nebêjin tu û Feqî Teyran. Îcar Feqî tu kes nedît hate xewna te. Belkî hûn rast dibêjin, lê hinku min xwe lê kir bela gorbihuşt xelasiya xwe ji min nedît û hate xewna min.

Hema bi çarînekê derbasî deriyê xewna min bû

Dil ji min neket xeyalan
Bûme perwana şemalan
Beriya husn û cemalan
Naşêm bêtim wan hevalan

Min dît Feqî ji hubê bi keder e. Min jî bi çarînekê bersiv da wî. Min got şêxê min:

Xewna min ji hukmê şubhet e
Te bibînim bo min rûmet e
Qewlê te bo min hurmet e
Peyva te bo min muhabet e.

Min dît Feqî qet helbesta min neeciband Min got qey ez jî nîv helbestvan im. Na keko! Ma li ber Feqî mirov dikare qala xwe bike. Xuyabû min jî ji xwe re hin tişt li hev anîbûn Mîna xelkê me yê Carbekirê gotî, min hema diçirand. Hindik mabû Feqî bigota "Xorto! Te qeşmertiya helbestê kir. Zihar bi ber Xortaniya min ket, negot. Gotin doş kir anî ser pêvajoyê:

Reyhanin sosin û werd
Tu dev ji wan tiştan berd
Ez wekî zat û ferd
Min heye gelek derd
Bêje ka ew pêvajo
Kê ber vî şer ajo
Çima siyahmaran kire seyran
Kanî muhabbeta bira û cîran
Kanî ew edîb û xetibên wî karî

"Tarûmar bûn can û cism e
Pirsiyar in cîran û xizm e"
Can hezîn im li Miks û Hîzan
Şahîd e meyt ê xort û qîzan
Kê dilbera min bi huzne giriyan
Çima ew man bê zar û ziman

Hêrsa Feqî zêde bûbû. Min got ez bi çarînekê ber dilê wî bigirim: Min got şêxê min.


Em bi rewşa xwe hezîn in
Em ê bi edeba xwe bixwînin
Ehlamên (xewnên) we pêk bînin

Hindik mabû Feqî bibêje va ye te li ber çavên min helbesta klasîk qetil kir. Ma ez ê çi hêviyê ji te bikim. Madê wî tirş bû û ji xewna min derket.

www.arsivakurdi.org

## SEYDAYÊ CEGERXWÎN

Seydayê Cegerxwîn di rexneyên xwe de wêrek bû. Wekî nûnerê Partiya Demokrat a Pêşverû beşdarî kongreya Kurd a Mele Mistefa li dar xistiye bûye û piştî kongreyê Mele Mistefa ji Seyda re dibêje: "Seyda em penaberî Rûsyayê bûn Stalîn em diavêtin nav rêhesinan me kevir dişikandin. Te jî li vir pesnê Stalîn dida."




Seyda dibersivîne, "Ji bo ku li we miqate be min pesnê wî dida, ne ji bo xwe." Wê çaxê baweriya Seyda ew bû ku Sowyet dê bi riya Sosyalîzmê Kurdan biqedîne.

Ne tenê Seyda, Mele Mistefa bi xwe jî wisa bawer dikir.

Piştî vê kongreyê Mele Mistefa hebestek ji Cegerxwîn dixwaze, Cegerxwîn jî di helbesta xwe de çêrî dewlemendan dike.

EY DEWLEMNDÊN BÊŞEREF ÇI DIKÎ
ZÊR Û PERE SED HEZAR ZÊRAN TÊXIN
KURTANÊ KERANEV PEREYÊN
BÊRÛMET BÛNE SEDEMÊ KUŞTIN Û
TALAN Û CENGAN

Îcar dewlemendên li dora Barzanî yeko yeko rabûne, reviyane û Barzanî gotiye, "Kuro te çi kir, te civat ji hev belav kir?"

Seyda di 1922'an de dest bi helbestan dike heta 1945'an şiîrên wî nebûbûn dîwan.

Celadet Bedirxan dibêje, "Were Şamê em ê helbestên de di Kovara Hawarê de çap bikin. Seyda dil heye biçe lê perê wî tune.

Melayê navdar Şêx Ehmedê Xiznewî bi alî wî de tê. Pere dide Cegerxwîn da ku biçe Şamê helbestên xwe çap bike. Mirîdên wî dibêjin, "Şêxêm tu pere didî Cegerxwîn lê wî di helbesta xwe de çêrî te kiriye."

Şêx Ehmedê Xiznewî dibêje, "Bila be, Cegerxwîn şairekî mezin e. Tiştên ku ew dibêje bi nirx in. Divê em qîmetê bidin hunare wî."

## JIYAN ÇI YE?

Jiyan wekî kurtikê (îşlik) li ser mirov e. Gava te bişkoka pêşîn şaş lê da ya dawî jî şaş dibe.

Jiyan meraq e; sêva ku li serê Newton ket a Golden bû an ya Amasya bû?

Hirça ku parsuyê bavê min şikand nêr bû an mê bû?

Jiyan lêgerîna bersivekê ye: Piştî ku mirov dimire çima neynûk û mûyên mirov dirêj dibin?

Jiyan mîna morîka (gêrik) sorik meşa hêdî hêdî ya li pey xeyalên xwe ye. Negihîje xeyalên xwe jî di wê rêyê de mirin e. Mirovek herî zêde 15 rojan tî û birçî dikare bijî lê bi şorekî (gotinekê) xerab wekî çiqilê darê di cih de dişikê. Jiyan bi xwendina îlana mirinekê an jî bi bihîstina telqîneke tê bîra mirov.

Jiyan di şert û mertên giran de bi mirovên çak (qenc) re jiyîn e û li hemberî zordariya desthilatdaran serî netewandin e.

Jiyan ji dêvla emrekî dirêj û bê îrade rojek tenê be jî serî azad ser piyan mayîn e.

Jiyan li ser bûyerên qedîm serî êşandin e. Gelo ew delaliya ku Melayê Cizîrî helbestên xwe li serê dinivîse kî ye? Dîlbera "horîsurişt", "xunceleb", "şîrinsur", "porsor" û "kezîzer" ji ku ye? "Hebîba xemrevîn", "zêrînkemer" a "serniwaz" qîza kê ye? Keça Mîro Botan e yan Keça Mîrê Heskîfê ye? Jiyan li ser van pirsan serî êşandin e, heya yekî bang kir û got; Ma her tişt bi te maye? Li pey xeyalên xwe meşîn e.









www.arsivakurdi.org

# Murat İpek





murat



murat ipek


murat ipek


Bela xwe ji vî GOLIK'î nedin. Siyasî ye, ji girtîgehê derketî ye
murat ipek


KAPiTALiZ
murat ipek




GOLİK REVİYA
murat ipek

# REMILDAR - Gulpêri




**BERAN**
21 Adar- 20 Nîsan

Hema tu tiliya xwe dixî qula mozan û pişt re jî dibêjî, "Ma min çi kiriye?" Ji xwe re biaqil be û têkilî karê kesî nebe. Van rojan li xwe muqate be.



**GA**
21 Nîsan- 21 Gulan

Jin û mêrên Ga di evînê de jî ne kêm in heyran. Lê hûn encax dikarin bi jinên Masî û mêrên Dûpişk re li hev bikin. De bikenin, vê carê min ji we re torpîl çêkir ha!




**CÊWÎ**
22 Gulan- 21 Hezîran

Hema pitepita te naqede lê dîsa jî stêrka te dibiriqe. Heyv û Venus li hev kirine ji bo karê te mil dane hevdû. Ma tu hê jî çi dixwazî ji Xwedê gidî?



**KEVJAL**
22 Hezîran 22 Tîrmeh

Ox, fikefika te ye! Av ji kaniyê nan ji baniyê. Welehî girtiyên hebsê jî ne wekî te rehet in heyran. Hema piçekî wê qûna xwe yî mezin ji erdê rake û têkeve tevgerê.



**KEVAN**
23 Sermawez- 21 Kanun

Tu difikirî ku dev ji karê xwe berdî lê qesem bi navê Xwedê xaltîka Jupîter û Saturn dê astengî derxin pêşiya te. Hema li ser dûvê xwe rûnê û dev ji karê xwe bernede.




**KARIK**
22 Kanun- 20 Çile

Sê rê li pêşiya te ne. Çima sê rê li pêşiya te ne ez jî nizanim! Ê hema tu di kîjanî de diçî here heyran, ma qey bi min ketiye?!



**ŞÊR**
23 Tîrmeh- 22 Tebax

Felsefa te; "hûr bajo, kûr bajo, dûr bajo lê bila hêstir nehêşe" ye. Ê heyran ji xwe re erebeyekê bikire him xwe him jî me ji vê zehmetiyê xelaske wî!



**SIMBIL**
23 Tebax 23 Îlon

Welehî qismetê te vekirî ye. Tenê astengiyek haye. Ha îro ha sibê dê xeberek bê ji te re, lê xêr e an ne xêr e ez wê nizanim. Tu û şensê xwe.



**MÊZÎN (TERAZÎ)**
24 Îlon- 23 Cotmeh

Dev ji niviştê û miviştan berde. Çav li ser we ye heyran. Weyla çavên li ser we birijin. Eger hûn deh lib ji Kovara Golik belav bikin welehî çi çav li ser we namîne.



**DÛPIŞK**
24 Cotmeh- 22 Sermawez

Heyran ev çi çinevina te ye? De kî têkeve dawetê divê xwe bihejîne wî. De bes, zêde mereqan neke dê Xwedê rêyeke din ji te re bibîne.



**DEWLIK**
21 Çile- 19 Sibat


Mêrên Dewlikê ne wekî jinên Dewlikê ne. Ew piçekî din zorê bidin xwe ew ê bibin Donjuanê Kurdan (Tolazekî Navdar e). Ji xwe re piçekî efendî bin heyran, û çav bernedin qîzên xelkê.



**MASÎ**
20 Sibat- 20 Adar

Ê te hîn ji siyaseta jina xwe fam nekiriye îcar ya welêt? Tew mala min ê, hema ji xwe re di alt kamîsyonê de bimîne ev besî te ye û serê te zêde ye. [09/08 06:27]

## PEND û ŞÎRET



Di dîroka Kurdan de bûyerên jê dersgirtin gelek in.

Di raperîna Agirîyê de yek ji wan wiha diqewime.


Şer di asta herî bilind de ye. Hêzên êrîşkar davêjin ser gundan. Tu pîvanên şer nasnakin Di wê kêliyê de şervanekî ciwan tê hafa Serfermandar Îhsan Nurî Paşa:

Serfermandarê min, dijmin avêt ser gundê me zarû zêçê me kuştin, warê me xira kirin, em jî bavêjin ser warê wan tola xwe hilînin.

Îhsan Nurî, bersiveke dîrokî dide şervanê sergerm yê ciwan Dibêje:

Mekin. Dijminê me xedar e. Dewletlî ne. Saz û amûrê wan qewî ne. Zilma xwe dipeşkînin tovê tolê direşînin. Gaxê ku hûn ketin ber bayê wan. Azweriya heyfhilanînê di dilê we de bilqiya, Kiryarên we çêbûn, poştê kujertiyê daket ser milê we, Wê çaxê ewê ji raya giştî re bibêjin "binihêrin ew-ên ku hûn dibêjin mexdûr in, ne mexdûr in kujer in". Dê we têxin dilqê hovan, bikutin çavê mirovan Wê dehên xwe bikin yek, yeka we bikin deh. Amûrên ragihandinê ku di destê wan de ne dê dijberî we bi armanca ku rastiyê berewajî bikin bi kar bînin.



# RÊGEH

## Atilla Barışer











### Serxet-Binxet



Atilla Barişer








www.arsivakurdi.org